التعاون الألماني
DEUTSCHE ZUSAMMENARBEIT

Published by
giz Deutsche Gesellschaft für Internationale Zusammenarbeit (GIZ) GmbH

TAKAMUL IV – تكامُل

Pirs û Bersiv

Belgeya duyemîn

TAKAMUL foneke ji bo bihêzkirin û pêşxistina şiyana Civaka Sivîl a Sûriyeyê û piştgirîkirina hevgirtina civakî ye.

TAKAMUL peyveke erebî ye ku tê wateya "entegrasyon"ê û nîşana armanca fonê ye ji bo xurtkirina têkiliyên di navbera rêxistinên civaka sivîl a Sûriyeyê de, hem li hundir û hem jî li derveyî Sûriyeyê.

TAKAMUL beşek e ji projeya **GIZ BRIDGE** (Xurtkirina Kapasîteyên Civaka Sivîl a Sûriyeyê). Projeya BRIDGE ji aliyê **Wezareta Federal a Almanyayê ya ji bo Hevkariya Aborî û Pêşveçûnê (BMZ)** ve hatiye erkdarkirin û fînansekirin.

التعاون الألماني
DEUTSCHE ZUSAMMENARBEIT

Published by
giz Deutsche Gesellschaft für Internationale Zusammenarbeit (GIZ) GmbH

TAKAMUL IV

Pirs û Bersiv (beşa 2yemîn)

Mercên beşdariyê	
Q	Gelo rêxistinek dikare di heman demê de hem ji bo TAKAMUL IV û hem jî ji bo bernameyeke din a GIZê serlêdana fînansekirinê bike û fonê werbigire?
A	Erê, ti sînorkirin tune ne ji bo wergirtina fînansekirinê hem ji TAKAMUL IV û hem jî ji bernameyeke din a GIZ a Sûriyeyê.
Q	Eger rêxistineke dîasporayê ya li Almanya qeydkirî û xwedî ezmûneke berfireh di fonên giştî de serlêdana zarfeke 100,000 EUR li gorî rêbaza Tandem bike, gelo serlêdan ji yek hevkarê Sûrî yê herêmî (hevserlêder) zêdetir hewce dike?
A	Erê, vebijarka fînansekirinê ya 2yemîn ji bo serlêderên sereke hatiye veqetandin ku xwedî ezmûneke berfireh in di birêvebirina fonên giştî de û dikarin bi zêdetirî serlêderekî hevpar re bixebitin.
Q	Gelo rêxistineke ku bi awayekî yasayî li Almanyayê hatiye tomarkirin, dikare bêyî ku bibe serlêderê sereke an jî hev-serlêder, beşdarî TAKAMUL IV bibe?
A	TAKAMUL IV bi modela Tandem bi taybetî rêxistinên civaka sivîl ên Sûrîyeyî yên ku hem li hundirê Sûriyê û hem jî li dîyasporayê li Almanya kar dikin, fînanse dike. Li gorî vê çarçovê, rêxistina dîyasporayê ya li Almanya qeydkirî wekî serlêderê sereke kar dike, di heman demê de rêxistina ku li Sûriyê kar dike wekî hevserlêder kar dike.
Q	Gelo rêxistinên civaka sivîl ên ne-qezencxwaz ku li Almanyayê hatine tomarkirin, dikarin wekî serlêderê sereke ji bo TAKAMUL IV serlêdanê bikin? (mînak: Welthungerhilfe)
A	Divê serlêderê sereke rêxistineke diyasporaya Sûriyeyî be ku li Almanyayê hatiye tomarkirin, an jî rêxistineke ne-qezencxwaz be ku ew jî li Almanyayê hatiye tomarkirin û di çarçoveya rewşa Sûriyeyê de kar dike.

Q	Gelo rêxistinên xêrxwaziyê dikarin wekî serlêderê hevpar serî li fona TAKAMUL IV bidin?
A	Divê hev-serlêder li Sûriyeyê bi cih bûbin û li wir hatibin tomarkirin. Rêxistinên xêrxwaziyê yên xwecihî yên Sûriyeyê dikarin wekî hev-serlêder ji bo fonên TAKAMULê beşdar bibin, bi şertê ku li Sûriyeyê tomarkirineke wan a derbasdar hebe û ew ne ji bo qezencê bin.

Pêşniyara projeyê

Q	Pîvana domdariyê ji bo projeyên şeş-mehî çawa tê nirxandin, û GIZ ji bo misogerkirina bandora piştî bidawîbûna projeyê, li benda kîjan mekanîzmayên sereke an encamên radestkirî ye?
A	GIZ qebûl dike ku guherîna domdar û demdirêj pêdivî bi demê heye. Lêbelê, pêşniyar dê li gorî potansiyela wan a ji bo afirandina bandorên mayînde yên piştî bidawîbûna projeyê bên nirxandin; ev bandor dikarin bi rêya xurtkirina têkilî, kapasîte, tor, mekanîzmayên civakî an pratîkan, û her wiha bi rêya derfetên ji bo dubarekirin, adaptasyon an berdewamkirina çalakiyan (li cihên ku guncaw be) pêk werin. Ev yek bi giranî girêdayî sêwirana projeyê û nêzîkatiya cîbicîkirina çalakiyên pêşniyarkirî ye.

Q	Gelo serlêderê sereke li Almanyayê dikare zêdetirî yek pêşniyara TAKAMUL IV pêşkêş bike?
A	Na. Ne serlêderê sereke û ne jî serlêderê hevpar dikarin di zêdetirî pêşniyarekê de cih bigirin.

Darayî û budçe

Q	Ji bo alîkariyên darayî yên heta 100,000 EURî ku pêdiviya wan bi zêdetirî yek hev-serlêder heye, gelo divê rûpela "veguhestina fonan" were dubarekirin da ku ji bo her hevkarekî rûpeleke cuda were amadekirin?
A	Erê, divê forma "Veguhastina Fonê" li gorî hejmara hev-daxwazkaran were dubarekirin.

Q	Gelo lêçûnên pêkanînê yên ji bo serlêderê sereke yê li Almanyayê, tenê bi karmendan (mînak, Rêveberê Projeyê, Rêveberê Darayî) ve sînorkirî ne?

A	Divê hemû karmendên ku di projeyê de cih digirin, li gorî asta ked û xebata xwe di budceyê de bên bicihkirin. Her wiha, budceya serlêderê sereke dikare lêçûnên veguhestina fonan ji bo hev-serlêderê li Sûriyeyê, û lêçûnên firînên navneteweyî yên ji bo serdanên li cem hev-serlêder jî di nav xwe de bihewîne.
Q	Gelo serdanên çavdêriyê dikarin di nav budçeya serlêderê sereke de cih bigirin?
A	Erê; lêbelê, divê serlêderê sereke pêwîstiya serdanê, li gorî dema projeyê û cewherê çalakiyên wê, rave bike.
Q	Gelo divê lêçûnên îdarî wekî %7ê budceya giştî bên hesabkirin?
A	Mesrefên îdarî ji bo serlêderê sereke %7 û ji bo hev-serlêder %2 hatine diyarkirin.
Q	Herçend di şablona budceyê de behsa "Eigenanteil"eke (beşdariyeke) muhtemel tê kirin jî, di vî warî de çi rêberî dikare were dayîn?
A	Beşdariya hev-serlêder vebijarkî ye, û ji bo TAKAMUL IV hewcedarî bi fînansekirina hevpar nîne, ji ber ku ev bername %100ê lêçûnan li xwe digire.
Q	Gelo pêwîst e ku serlêderên sereke, yên ku ji bo 100.000 Euroyî serlêdan kirine, budceyê li gorî rolên hev-serlêderan bi awayekî wekhev di navbera wan de dabeş bikin?
A	Na; dabeşkirina fonan di navbera hev-serlêderan de divê li gorî çalakî û rolên wan ên taybet di nava projeyê de be, bi şertê ku ev dabeşkirin di pakêta pêşniyarê de bi awayekî zelal were ravekirin û hûrguliyên wê bên dayîn.

Raporkirin û kontrolkirin

Q	Di rewşên ku rîskên wan hebin û karibin gefê li pêkanîna projeyê bixwin an jî bibin sedema derengketina cîbicîkirina projeyê, divê kîjan mekanîzmaya fermî ya ragihandinê were bikaranîn da ku GIZ were agahdarkirin?
A	Di wan rewşan de, hevkar divê bi rêya nameyên elektronîkî yên nivîskî bi fermî xala sereke ya GIZ-ê ya diyarkirî agahdar bikin. Divê di agahdarkirinê de cewherê xetereyê were destnîşankirin, bandora wê ya texmînkirî li ser dema projeyê (derengketina rastîn a tê

	payîn) were nirxandin, û tedbîrên tavilê yên kêmkirina xetereyê yên herêmî bi hûrgilî werin ravekirin. Dûv re GIZ dê li gorî rewşê bi hevkar re ji nêz ve bixebite da ku van pirsgirêkan çareser bike.
Q	Gelo ji hevkarên herêmî tê xwestin ku hesabgirekî pispor û nermalaveke pejirandî bi kar bînin, û divê ew li gorî kîjan pîvanên hesabgirî, raporkirin û kontrolkirinê tevbigerin?
A	Weke wergirê sereke yê alîkariya darayî, serlêderê sereke berpirsiyariya tam a yasayî û darayî ya projeyê hildigire ser milê xwe. Ji ber vê yekê, GIZ ji serlêderê sereke dixwaze ku xwedî karmendên darayî yên bi ezmûn û pergaleke nermalava hesabdariyê ya taybet be.

- Heke pêwîstiya we bi ravekirina zêdetir hebe, ji kerema xwe bi tîma TAKAMULê re bi rêya navnîşana takamul@giz.de têkiliyê deynin.
- Em li bendê ne ku serlêdana we werbigirin û ji bo we serkeftinê dixwazin.